Bifikire tu rojnamevan î. Tu li Dêrikê, Qamişlo, Amûdê, Serê Kaniyê yan li bajarekî din dijî. Bifikir ruxseta te ya kar hebe û hertiştê te li gor qanûna desthilatdarên li deverê be. Bifikire tu li kolaneke Amûdê karê xwe dikî. Ji nişkê ve endamek ji endamên polîsên trafikê ji piştê te de destê xwe davêje çakê te û te bi aliyê xwe ve dikişîne. Bifikire ew polîsê trafikê bi hêrs û bi dengê bilind ji te dipirse bê ma tu çi dikî. Mîna ku vî polîsê trafikê tawanbarek zeft kiribe. Bifikire ew ne carek û ne du û ne sê û ne deh caran pêk tê. Bifikire tu dixwazî ji saziyeke Birêvebiriya Xweser agahiyekê ji bo nûçeyekê an raporteke bistîni. Bifikire karmendê wê

saziye naxwaze bersivê bide te, çimkî wilo jê hatiye xwestin. Ne ji ber ku agahî veşartî û sirî ye, na, tenê ji ber ku tu ji alaveke ragihandinê re kar dikî ku di Birêvebiriya Xweser de hin alî hene jê ne razî ne. Çima? Tenê ew alî û Xwedê dizanin! Bîn bîra xwe: Ruxseta te ya kar heye. Ev du nimûne ne ji gelek nimûneyên ku rojane li deverên Birêvebiriya Xweser pêk tên. Listeya bînpêkirina mafên rojnamevanan gelekî dirêj e. Ji aliyekî ve bajarên li jêr desthilatdariya Birêvebiriya Xweser bajarên herî baş in li Sûriyê ji bo rojnamevanan. Eger em vê deverê bi deverên din li Sûriyê bidin ber hev. Li

vir peyamnêrên gelek alavên ragihandinê yên herêmî û cihanî hene. Li vir her roj rojnamevanên ji seranserî cihanê karê xwe dikin û dîsa vedigerin welatê xwe. Li vir ta radeyekê istiqrarek heye ji bo rojnamevanan. Rojnamevan dikarin karê xwe bikin. Ev aliyekî meseleyê ye. Aliyê din ew e ku hin saziyên Birêvebiriya Xweser bi keyfî bi rojnamevanan û alavên ragihandinê re didin û distînin. Birêvebiriya Xweser Yekîtiya Ragihandina Azad wek saziya ji bo dayina mafên kar ji bo rojnamevanan û alavên ragihandinê destnîşan kiriye. Tevî kêmaniyan, lê ev sazî erkê xwe bi cî tîne. Ew ruxsetan dide û alîkariya rojnamevanan

dike di karê wan de, ger pêwîst bû. Lê hin saziyên Birêvebiriya Xweser rêzê ji Yekîtiya Ragihandina Azad re nagirin. Çi karê polîsê trafikê, yan Asayîşan an Yekîneyên Parastina Gel, an an an bi karê rojnamevanan heye? Çima ew sînoren karên xwe derbas dikin û destên xwe dixin nav karê Yekîtiya Ragihandina Azad? Çima berpirsên Birêvebiriya Xweser rê li ber van bînpêkirinan nagirin? Li gelek deveran Asayîş ruxsetên kar ên Yekîtiya Ragihandina Azad qebûl nakin. Yekîtiya Ragihandina Azad û Asayîş du saziyên Birêvebiriya Xweser in. Lê endamê Asayîşan xwe hest

dike mîna ku ew dikare hertiştî bike. Ev ne li gor qanûna Birêvebiriya Xweser e. Pêwîstiya rojnamevanan bi saziyekê heye ku parastina mafên wan bike. Çi fêda Yekîtiya Ragihandina Azad e ku ew tenê ruxsetan dide, lê saziyên din ên Birêvebiriya Xweser van ruxsetan pirê caran qebûl nakin? Ev bînpêkirinên rojane kesayetiya Yekîtiya Ragihandina Azad qels dikin, wê tune dikin. Ev şaşıtiyeke mezin e. Ji Birêvebiriya Xweser tê xwestin ku rê li ber van bînpêkirinan bigire. Ji Birêvebiriya Xweser tê xwestin ku saziyên xwe agahdar bike ku bi

rojnamevanan re alîkar bin û hemû agahiyên li ber destên wan pêşkêşî wan bikin. Ji Birêvebiriya Xweser tê xwestin ku rêzê li saziyên xwe bigire û nehêle saziyek destê xwe bixe nav karê saziyeke din. Serketina Birêvebiriya Xweser girêdayî ye bi misogerkirina azadiya nerîn û derbirînê. Rojnamevan û alavên ragihandinê pêkahtiyên sereke ne yên civakeke azad û demokrat. Rêzgirtina li wan rêzgirtina li tevaya civakê ye. Bînpêkirina mafên wan dibe sedem ji bo têkçûna vê civakê.

*Birêvebirê Giştê yê Saziya ARTA ji bo Ragihandinê

Lêvegêra Kurdî û Hêviyên Gel



Luqman Silêman

«Pêwîste Ku Rapirsînek Bê Çêkirin, Ji Bo Dî Dîrokê De Rûreş Dernekevin»

Di baweriya min de rîzîkoya ku herdû meclis li hev bikin û xalê lêvegêra Kurdî cîbicî bikin pir qels in, Ji ber ku di pirojeyê ji hev cida ne û her meclisek girêdanin wê cida hene û berjewendiyê cida hene û kêr zêde bêcar in, gereke gavên xwe li gor meherê ku her yek ji wan pê ve girêdayî ne bavêjin . Dema ku (PYD) ji hevdişînê ku ji bo avakirina meclisa Kurdî xwe vekîşand û her deh partiyên meclisa Kurdî destnîşan kirin, celda Kurdî hinekî aram bû û ji bin wê fişara derûnî derketin û piştigiriya xwe ji yekîtiya Kurdî re diyar kirin. Di wê navê re Meclisa Gel ya Rojavayê Kurdistanê jî hat destnîşankirin ji hêla (PYD) ve. Ji rojê pêşî de diyar bû ku Meclisa Kurdî bê piroje ye, ji ber ku hina ji wan digotin em ne bi şoreşa Sûrî re ne, lê hina jî digotin em bi yek çavî li rîkebiriye û li rêjîmê dinêrîn bi kinayî helwesteke zelal li cem Meclisa Kurdî nebû. Ji rojê pêşî de (PYD) xêza sisiyan ji vê şoreşê dişopînin, û em ê li gor xwe bixebitin. Peyê bo weka kiwarek mêşa hingiv û di meydandê de xebitîn, heger ku hin peyman bi rêjîmê re çekirbin yan rêjîmê çavê xwe ji kiriyarên wan girtibe û (PYD) xwest sûtê ji wê rewşê bike ji ber ku ji rojê pêşî de xuyabû ku rêjîm dixwaze

Kurda dûrî şoreşa Sûrî bike. Ez bawer im ew karê ku Meclisa Rojavayê Kurdistan kirî Meclisa Kurdî jî dikaribû bike lê nekir çima ne diyare ??!..

Dema ku li ser erdê nakokî di nav herdû meclîsan de gur bûn, serok Mes'ûd Barzanî, ew vexwestin cem xwe û xwest wan li hev bîne, di vê pêngava hestiyar de û ji dêvla bîst û çar kursiyê ku (PYD) ji Meclisa Kurdî xwestin û meclîsê erê nekir li Hewlêrê serok Mes'ûd pêncî kursî di desteya bilinda Kurdî de da wan lê kesî ji Meclisa Kurdî negot ev çî ye?Çima ji bîst û çara bûne pêncî?

Lê diyar bû ku cardî bi hev nakin ji ber wek ku me got di projeyên xwe de ji hev cida ne. Meclisa Rojavayê Kurdistanê ku niha navê wê hatiye guhertin û bûye(Tev-Dem) di Desteya Hevrêziya Niştimanî de ye, û gêrayî projeyên, Qendîl, Tehran, Şam û Bexdave ye, béguman berjewendiyên wan di deverê de hene û meclisa Kurdî di hemahingiya Sûrî de ye, û ew jî bi projeyên Hewlêr, Enqere, Qeter û Emerîka ve girêdayî ye. Ev herdû proje ji hev cîwaz in ez bawer im ta ku guhertin nekeve rewşa Sûrî de ji ber ku ev hevsengiyek pir zor e û herdû jî

kêm zêde ne bi destê xwe ne. Ez bawer im herdû meclis birîkarê xwe yê bingihîn jîbir kirine ji lewma jî kiriyarê wan pir bandora xwe li celda Kurdî kirin û mîlet jihev xistin berê wî dane tunelek tarî û bê dawî. Di cara pêşî de çaxê ku herdû meclis li Hewlêrê bûn ji bo lihevkerîna şandeyek Tirkî çû Hewlêrê û hevdişînek bi Meclisa Kurdî re çekir, bê ku Meclisa Kurdî bêjeem bêyî hevalbendê xweyî Meclisa Rojavayê Kurdistanê narûnin..!Bêguman ev tev peyman in, lê diyare em xweşik naxwînin ku (PYD),li Rojavayê Kurdistanê xwedî hêzeke xurt e û bûye hejmarek zehmet ku lê newê vegeandin, lê Meclisa Kurdî ne xwediyê tiştekî ye. lewma hemû peymanên ku tên lidarxistin pûç û bê encam derdikevin,tevlî ku îro zemînek guncaw heye ku herdû meclis hemî berje wendiyên xweyî ên teng li ser refikê deynînin û hinekî li berje wendiyê mîlet xwedî derkevin û nema wî piştguh bikin. Gerek herdû meclis îro di vê dema girîng de rapirsînek pêwîste ku bê çekirin ka ev mîlet çî ji wan dixwaze?Heger ku bixwazin nebin gunehkar di dîrokê de.....



Talanî û Nakokiyên Nixumandî Heseke û Jiyana Hevbeş

"divê em li ser jiyana hevbeş di navber pêkhatayên din jî (Kurd, Xiristyan û Ereban) de, rawestin. Û helbet wê ew mijar deriyin din li ser pêkhatayên din jî, veke."

Ebas Mûsa

Di demekê de ku bajarê mîna Heseke, li Rojavayê Kurdistanê, gellek pêkhatê de dijîn (Kurd, Ereb û Xiristyan...), di taxên pir-Kurd de kesin Ereb dijîn, bêyî ku tu pirsgerêkên nijadperestî peyda bibin, her wiha Kurd jî di taxên pir-Ereb de. Tim pirsgerêkên ku derdikevin girêdayî jiyana rojane ne, (dibe kuh in alozî derketibin holê piştî 2011an de). Carinan dema ku pirsgerêk di navbera Kurd û Ereban de çêdibûn, tim kesin hebûn dixwestin ku wê bi mijara neteweyî ve girê bidin, partiyên siyasî yên Kurdî dixwestin bidin xuyan ku nakokî li ser mijareke netewperestî çêbûye, da ku nêrîna xwe - ya ku dibêje erebperestan tim dixwazin nakokiyên çekin, da ku jiyana hevbeş pê biêşînin-piştast bikin. Ev jî bi awayekî teng ne gihişte da bibe diyarde. Ereberperestên (Be'sî) wan jî ji aliyê xwe ve dixwestin ku vê nêrîne belav bikin, lê bi rengekî berferah, qena pirojeya «Be's» pêk bînin, a ku li ser serkeftina neteweya Ereban ava kiriye; di rêya erebkirîna re, ji ber dibêje: Kurd Îsraîlek din in di laşê welatên Erebî yê mezin de. Lê eger em ji nêzik ve li ser vê mijarê rawestin, gelo em dê çî bibînin? Dibe ku ya rast ew be, hevjiyanek di navbera Kurd û Erebande timhe bû, lê partiya«Be's» dixwest ku nakokiyên bikar bîne, da ku pirojeya xwe ya erebperestiyê

birêve bibe, lê em nikarin Kurdan an siyasîmedarên Kurd bi heman pîvanê bipîvin, ji ber ku tu pirojeyên Kurdperestî, bi wî rengê tund, di hişmendiya siyasên Kurdî de peyda nedibû, û ne jî pirojeyên bi wî rengî, ji ber ku (bikêmanî) hema ne deshilatdar bûn. Nêrînek di nêv civakê de peyda dibû – nemaze piştî hin bûyeran- ku ereb û Kurd tu carî ne dost in, bûyerê ku li gellek bajarên Kurdî bûyî (li Rojava), mîna Heseke, Serêkaniyê..., talaniya ku bûyî piştî serhildana Qamişlo 2004 an bi destê Ereben sivîl; ew talaniya ku hat belgekirin (talanî tenê li ser dikanên Kurdan bû, li bazarên giştî), lê bi erêkirina rêcîmê û pîrozbahiya Be's bû. Em dikarin bibêjin ku Be's -nemaze piştî wê talaniyê - bawerî bi jiyaneke hevbeş û rewşa di navbera Kurd û Ereban de hinekî şikand, di wê demê de Kurdan nêrînek tûj û tund li vê mijarê nêrîn, lê hertim girêdayî bû bi hişmendiya Be's, Kurdan nas dikir ku ew nakokî hatine çekirin ji hêla Be's û erebperestan ve. Di jiyana rojane de, bi şeweyekî din li vê mijarê dihat nêrîn, di bajarên mîna Heseke ku Kurd û Ereb bi hev re dijîn, bi rengekî xweşik, belkî rengin mîna xalûxwarzetî yan kirîvantî, bêhtir bi roleke baş radibûn, tu pirsgerêkin mezin nebûn di barê jiyana hevbeş de, welatiyên Kurd li taxên pir-ereb an kesên Ereb

di taxên pir-Kurd de jiyaneke normal bi hev re derbas dikirin bêyî ku dijminayetiyeke hebe. Li himber vê nêrîne dibe ku nêrîneke din hebe, û dibe ku nêzikî rastiyê be jî, ev nêrîn dibîne ku nakokî hertim hebûn, lê bi tirsê nixumandibûn, an jî mayîneke li benda destinan bû ku pê bilîzin û biteqînin. Di bûyerên ku vê dawiyê li bajarê Heseke qewimîn -19-10-2015ande, dîsa talanî çêbû (erê ne bi rengekî berfireh bû mîna 2004 an, lê bi heman rengî bû), wêneyên ku çalakvanan belavkirin, dide xuyanku dikaninhatine talankirin, ew dikan jî yên Kurdanin, wek ku nişteciyan bajêr û çalakvan dibêjin. Dibe ku ev nameyek be ji rêcîmê, da bibêje: Ez dikarim talana we bikim, bi destên cîranên we yên Ereb, helbet tim kesin henin ku amade ne vê namê bikin rastiyek dema ku rêcîm bixwaze. Jiyana hevbeş di kirîzekê de ye, û girêdayî ye bi kirîza Sûriyayê ve bi tevahî, ji dema deshilatdariya Be's û ta piştî serhildana Qamişlo 2004an û Şoreşa Adara 2011an ve, û eger em bixwazin li ser vê mijarê rawestin divê em li ser jiyana hevbeş di navber pêkhatayên din jî (Kurd, Xiristyan û Ereban) de, rawestin. Û helbet wê ew mijar deriyin din li ser pêkhatayên din jî, veke.

Qiralê Strana «Romans» Hunermend Şeyda Ji «Bûyerpress» Re Diaxive

- Siyasetmedarên me û dewletên hawîrdor şoreşa Sûrî beravêfî kirin, nehiştin ew gul bipîşkive û bihnê bide.

- Ez her în bi xortan re derdiketim xwepêşendanan ji bo Sûriyê, bo mirovatiyê, bo hemû netew û hemû Olan.

- Mixabin di hemû beşê afrandinê de hîn gelek li Rojava mane, hunermend tenê nemane.

-Amûdê dayika min a duyem e, her kes ji min re dibêjin tu qet nikare bê Amûdê bijî.

- Miletê ku Seydayê Cegerxwîn, Seydayê Tîrêj, Ferhadê Içmo, aniye dikare her û her afrênerên helbestê bîne..

- Kesek nikare kela dilê şoreşan vemirîne, her û her şoreş biser ketine.

- Gava ku min dît ez bûme bar ezê dakevim û dev ji hunerê bîqerim.

- Mixabin Kilîpa min ji aliye çîrokê ve ne li gor daxwaza min derket

.- Min di erdê de kar kiriye, heta berî çar salan jî min di erdê de cotkarî û çandinî dikir.

- Ez bi xwe «Romans» distrêm ev şeweya stranê li sernaserê cîhanê tê bikaranîn.

- Ez gelekî strana «Hîphopê» naşopînim.

- Bi rastî dengê xweş di nav jina stranbêj de ku bala min kişandibe tune ye..!

- Di nerîna min de gelek hene ku xizmeta strana Kurdî kirine, hin sax in, û hin jî mirî ne, tev heja ne ku bên xelatkirin.

Hevpeyvîn: Ehmed Bavê Alan

Navê wî yê hunerî Şeyda ye û navê ku dê û bavê wî li wî kirin Ehmed e, di sala 1971ê de, li bajarê Amûdê ji dayik bûye, xwendina xwe heta bekeloriyayê li bajarê Amûdê qedand, paşê li peymangeha muzîkê sala 1993an li bajarê Qamişlo bawernameya xwe wergirt, di sala 2001ê de zewiciye, bavê sê zaroka ye «Awat, Hîma, Ram». Niha li gel malbata xwe li bajarê Amûdê dijî.

- Şeyda çi dike û çi haziryên nû li rex wî hene ?

Nû li rex min elboma min ya bi navê»Biratî» ye, min ji demekê ve amade kiriye, pêwîstbû ku ew niha daketa nav guhdaran, lê mixabin êrişên ku tîr ser herêmên Kurdî de hişt ku kompaniya»VÎN»tv a ku min girêbesta vê albomê pê re girêdabû, ku ew daxistina vê elbomê rawestîne.Tevlî ku min du stran ji wan kiribûn kilîp, ew jî strana «Erê Bira» û ya «Her Wisa». Wek ku min anî ziman ji ber rewşa êrişên li ser Şengal û Kobanê, niha stranên ku tîr weşandin hemû stranên netewî ne, ji bo heza gel û şervanan bilind bibe, bi hêvî me ku ew rewş zelal bibe, û di nêziktirîn dem de ew elbom dakeve bazarê. Min stranek li ser Kobanê jî çêkir û hat weşandin, niha nûtirîn kar ku min bi dawî aniye kilîpa bi navê «Welatê Min» ji gotinên mamoste Ferhadê Içmo ne û ji awazên min in, ew jî birêvebirya kanala «VÎN»tv hate amadekirin, wê van rojan be weşandin, û ji bo Rojnameya» Bûyerpress» ez despêka strana xwe dibêjim:

Welatê min ka tu kanî
Ka jiyana Kamîranî
Li çar al ya ji birîna
Diherikin çem û kanî

- Çima hunermendên Kurd ku navdardibin berhemên wan dom dikin ta ku derdikevin ?

Gerek Elboma min di sala 2011an de derketa, piştî elboma min a 2008an «Ma Îro», di sala 2011an de Şoreş li Sûriyê lidar ket, ew karê ku min di wan salên bûrî de kir, min tomar nekir jiber her roj ji ya din kuştin, koçberî, talankirin bêtir dibû, sedema mezin ev bû ku kar hat rawestandî, hin sedemên din jî hene heta ku hunermend dom dike ku elboman derxe, sedmên aborî, tekînîkî, dabeşkirina muzîkê, alavên herî pêşketî, ev tişt hemû dibin asteng li ber hunermend, ya herî ku ez dibînim balkêş ew e, ku hunermend li ser elboma xwe biweste ji bo ku cihgirtî be, nav bide..Niha wek ku carek din bi awayekî din jî dibêjim, berî niha hunermend dirahişt bizqa xwe, elboma xwe tomar dikir, niha tiştên nû daketine holê

wek dabeşkirina muzîkê û alav pir bûne û tomarkirin gelekî pere lê tîr xerckirin, her CD digihê 40 yan 50 hezar dolarî ev li Tirkî dema ku tu tişkî profêşnal dagire. Elboma min a 2015 an ku kenala «VÎN» tv ji min re tomar kirbû 40 hezar dolar lê hat xerckirin.

- Wek hunermend û wek mirov we çawa şoreşa Sûriyê şopand ?

Wek mirov min tucarî xwe dûrî şoreşa mirovahiye nexistiye jibo rûmet û azadiya gelê me wek min got min çend stranên ku bêtir bi mirovatiyê ve girêdayî bûn min çêkirin, ji ber eger mirovatî nemîne tiştêk namîne navê wê rastî ye..! Ev şoreş her kes pê rabû û dengê xwe hilda, lê mixabin siyasetmedarên û dewletên hawîrdorê me şoreşa Sûrî beravêfî kirin nehiştin ew gul bipîşkive û bihnê bide, tiştêk nema ye di destê tu kesî de?

Em her û her amade ne ku ji bo vê şoreşê stranên çêkin, jiber ku em ji mirovatiyê hez dikin. Em xwe ji êşa gelê xwe dûrî kin.Di despêka şoreşê de em li Amûdê derdiketin xwepêşendanan, ez her îr bi xortan re derdiketim ji bo Sûriyê, bo mirovatiyê, bo hemû netew hemû Ol di vî welatê de bila bijî» «Siriyan, Erebb, Kurd. Yan jî Êzdî, Misilman, û Xiristî. Şoreş, Şoreşa gelan e, divê hemû tê de amade bin û tê de biser bikevin.

- Ew çi tiştin yan ew çi sedemên ta ku hunermend koçber dibe ?

Mixabin di hemû beşê afrandinê de hîn gelek li Rojava mane, lê hunermend tenê nemane, ew hemû heval û birayên min in, 98% niha li derveyî Rojava ne, ez pir xemgîn im, lê dîsa rewşa jiyanê û rewşa aborî hişt ku ew ji welêt koçber bibin, netenê hunermend sazvan jî, rola wan di hunerê de sereke ye, kesek nema ye ku Li tembûr, keman, Biziq, dabeşkirina muzîkê, ev hemû pêdiviyên hunermend in, ez dîsa dibêjim wek Şeyda xemgîn im ku hevalên min hunermend li Rojava nemane.

- We ji bo Kobanê û şengalê çi çêkiriye çi amade kiriye ?

Min ji bo «Kobanê» stranek çêkir, li vir dixwazim spasiya nivîskar mamoste Şahîn Soreklî bikim ji bo pêşgotina wî di strana Kobanê de, helbet helbest a mamoste Ferhadê Içmo ye , û hat weşandin, niha rewşa Kurdan di metisrînekê de ye, ji ber nema ye «Kobanê, Şengal Hesekekê» hemû êrişên hovane tîr ser herêmên Kurdan, loma wek min got niha min Strana «Welatê Min» Amade kiriye.

- Strana te « Erê Bira « bêtir ew nêzî êş û hestên biratî û mirovatiyê bû, lê kilîpa wê stranê rengê dî da, mînak, li nav kampên penaberan derçû û

bi keçek ku ew bi hemû şewey a kapîtalîzm di kilîp de diyar dibû ?

«Çima Şeyda li ser derçûna vê kilîpê bi wî awayî erê kir « ?

Rastî ew rexna te di cihê xwe de ye û ez ji wan kesên ku ji rexna aciz nabin ji ber ku dema rexin li hunermend dibin ew pêş dikeve û tiştê ku girêdayî bi karê min yê hunerî wek: helbest awaz, dabeşkirina muzîkê,ez çêdikim ez dikarim bersiva wan bidim, lê di kişandin û derhênera kilîpê de birastî ez gelekî li ser sekînim û ez bi derhinerê wê re rûniştim û min jê re got ev neneroka vê stranê û ez dixwazim wisa derkeve, lê mixabin Kilîp ne li gor daxwaza min derket ji aliye çîrokê ve, ne ji aliye kişandinê ve. Naveroka stranê zor xweş bû, lê di kilîpê de ew şaşî derketin, yê derhiner hemû dimênên ku hatin kişandinin cuda cuda bi hev vekirin, loma raman û hizra çîrokê wisa derket, lê ez ê hewl bidim ku ew şaşî êdî di kilîpên min de derbas nebin, ji bo her kes bigihê çîrok û xwesteka me ji stran û ji kilîpa wê stranê.

- Hûn çawa helbestên xwe dibêjin û hûn bêtir dixwazin ji kê re bistirênin?

Ew kesek wisa taybet tune ye, lê çend helbestvan hene ez ji wan re distrêm ew jî mamoste Ferhadê Içmo û Sefqan in, bi rastî ew ji min fam dikin ku ez çî dixwazim.

- Ev jî tê gotin dibêjin Şeyda nema ji vî kirasî derdikeve ?

Belê bi rastî min di elboma xwe ya nû de xwest ku ez hinekî rengîntir bikim, min du helbestên Nemir Cegexwîn tevli elboma xwe kirin. Em vegerin li ser mijara bijartina helbestê, ew bixwe helbest min dikîşîne xwe, ji bo ez wê bikim stran, çend pîver hene pêwîst e ku ez di helbestê de bibînim heta ku ez awazan jê re çêbikim, ez baş helbestê dixwînim û li helbestvanan jî guhdar dikim nexasim nîşê nû, û di vê elboma min de min stranek ji gotinê xortekî ciwan ku nû bidest nivîsandina helbesta bi Kurdî kirye, navê wî»Omîd» e xwediye gotinê strana «Her Wisa Şev Bê Te Bûrî Bê Xwedan û bê Sema» Ev stran jî min kir Kilîp

- Wek me dûbare kir bi sedê hezaran xelîk ji Rojava koçber bûne di nav wan de gelek hunermend û afirêner ji koçber bûne, win çima li Rojava mane ?

Bi rastî ta niha ez li vir mame û ez li bajarê Amûdê dijîm bi malbata xwe re bi tevahî û ez bi hêvî me ku rewîşê be guhertin û ez neçar nebim ku ez ji bajarê xwe derkevim.

- Çima tu mayî ?

Ji ber ku destê min ji bajarê min nabe

- Amûdê ji bo Şeyda çi ye ?

Her dem ez dibêjim Amûdê dayika min a duyem e, ji ber ku min ava wê vexwariye û bîranînin min yê zarokityê hemû li Amûdê ne û her kes ji min re dibêjin tu qet nikarê bê Amûdê bijî.

- Tu li kê guhdar dikî ?

bi rastî ez li hemû kesî guhdar dikim, ez ji hunermend Mihemed Şêxo gelekî hez dikim, û li Tehsîn Taha, Eyaz Yûsif, Se'îd Yûsif, Mehmûd Ezîz Şakîr, guhdar dikim hemû mamoste ne û cihê rêzê ne.

-Bi xwe re tu li kê gudar dikî ?

Ez dîsa ji te re dûbare bikim min gelekî guhdar kir li van hunermendên ku min navê wan anîser ziman, herwiha min gelek li strana Soran guhdar kiriye wek «Şemal Sa'ib û koma Kamkaran» û helbet li Hesen Zîrek, kawîs Axa, Hesen Cezrawî, baş gudar dikim, pê re jî ez baş li Bilind Ibrahim, Heval Ibrahim,Çopî, Nazdar jî guhdar dikim.

Başê, ev hunermend ji başûrê Kurdistanê ne, yê Rojavakê ji nîşê nû bala te kişand?

Bi rastî çî strana xweş hebe ez lê guhdar dikim.

- Baş e, te ewqas navê hunermendan ji başûrê Kurdistanê gotin, madengek tune ye ji Rojava ku bala Şeyda kişandibe ?

Na, ne ku dengê xweş tune ye lê çî karê ku hebê ez lê guhdar dikim, çî stran elbom derdikeve ez tînim û lê guhdar dikim, xwe ji berhemên nû dûrnakim dengê didu hene ez bi hêvî me ku di paşerojê de em bi hev re bikin.

- Başê ew kî ne?

Ez her dem dibêjim her hunermendek wek rengê gula ye û tev wek hev in li rex min.

- Tu kesî bala te nekişand ?

Na, nav li ba min nîn in..!

- Eger hat û ji te hat xwestin tu helbestvaneke Rojavayî xelat bikî tê xelatê bide kê?

Helbet ez ê vê xelatê bidim mamoste Ferhadê Içmo, ji nîşên nû jî hene lê navê wan nayê bîra min, jiber miletê ku Seydayê Cegerxwîn, Seydayê Tîrêj,Ferhadê Içmo, aniye dikare her û her afrênerên helbestê bîne..

- Eger hat û ji te hat xwestin ku hunermendekî Rojavayî bê xelatkirin tê xelatê bide kê?

Di nerîna min de gelek hene ku xizmeta strana Kurdî kirine, hin sax in, û hin jî mirî ne, tev heja ne ku bên xelatkirin.

- Dengê herî xweş di nav jina hunermend de, wek ku Şeyda lê guhdar dike kî ye?

Pîrsa te zehmet e û ez nikarim bersiva te bidim!Bi rastî dengê xweş di nav jina stranbêj de ku bala min kişandibe tune ye..! .

- Wek muzîkjen we ji kê re awaz çêkirine ?

Min ji hunermend Sefqan re gelek stran çêkirine wek» Li mizgeft û laleşê,Çavên te yên reş, Canê cana min». Û niha ez hinek awazan çêdikim, bi hêvî me ku ew kar here serî..

- Hîphop hûn vê şeweya stranê dişopînin û nerîna te li ser çî ye?

Bi rastî ev rengê nû ji muzîkê û hin xort li ser kar dikin û destên wan sax be, ez gelekî strana Hîphopê naşopînim.

- Tu dibîne ku strana Hîphopê di civaka me de rewşek saxlem e ?

Belê ez dibînim ew tiştêkî baş e, ji ber ku dema miletê Kurd karibe bi gelek şeweyan bistrê, ez vê gavê baş dibînim.

- Li gor ku em te dişopînin gelek hene bi şewaza Şeyda di hunerê de bikar tînin, gelo Şeyda bûye dibistanek mîna «Ciwan Haco,Tehsîn Taha, Se'îd Yûsif, û gelek navên din, ew hunermendê dibe dibistan helbet şagirtên wî çêdibin ?

Ez nikarim vê bersivê bidim, hinek din hebin wê bikaribin vê bersivê li ser Şeyda û staylê Şeyda bidin, min got «stayl» ji ber ku navê dibistanê di hunerê de giran û mezin e.

Ez bi xwe «Romanis» distrêm ev şeweya stranê li sernaserê cîhanê tê bikaranîn, û alavên muzîkê yên niha wek gîtara kîlasîk, gîtara nû, dabeşkirna muzîkê bi awayekî nerim û nûjen derdikeve.

- Li Sûriyê û li Rojavayê Kurdistanê bû 4 sal ku şoreş vêketiye, piraniya stranên şoreşan ritma bilind û merş in, û hîn Şeyda strana «Romans» distirê?

Dûbare dikim, ku ev şeweya stranê gerdûnî ye, nexasim piştî ku pêşketin kete tomarkirna deng de, di nerîna min de heger hunermend ji bo çî strana xwe çêke, anku bi çî şeweyî be, ew dikare xwe bigihîne guhdarên xwe, min di hemû stranên xwe yên piştî 2011an de, ji bo biratî û wekheviyê bang kir, ev peyama min a sereke ye di hunera min de.

- Xelatên ku Şeyda wergirtine ?

Min xelata Seydayê Tîrêj ji hêla Yekîtiya Nivîskarên Kurd Sûriya ve wergirt, û berî wê ji hêla Partiya Alwehdê ve jî ez û hunermend Se'îd Yûsif hatin xelatkirin.

- Em ê bên li ser elboma te ya binavê «Biratî» helbest û awazên wê yên kê ne ?

Belê ew ji 7 stranên bêtir:

*Biratî:gotin: Sefqan,awaz:Şeyda.

*Dilo Şêrîn Li Te Mihvanim Îşev, û Canê Civan Da Min Ku Bê:Gotin: Seydayê Cegerxwîn,

awaz: Şeyda.

*Her Wisa Şev Bê Te Bûrî Bê Xwedan û Bê Sema: Gotin: Omîd, awaz: Şeyda.

*Her Nesrînek Li Nav Baxan:Gotin: Ferhadê Içmo, awaz: Şeyda.

*Ger Du Ta Ji Porê Yara min xuyakir:Gotin: Sefqan, awaz: Sefqan.

*Min Bîne Bîra Xwe:Gotin: Sefqan, awaz: Şeyda.

- Ev çî raz e di navbera hunera te û xwezayê de?

Ez ji malbeteke cotkar im, û min xwe dît ez nêzîkê vê xuzayê me, min di erdê de kar kiriye,heta berî çar salan jî min di erdê decotkarî û çandinî dikir.

- «Ax û herî» çi wateya wan in li cem Şeyda ye ?

Baran bihna hemû tiştî xweş dike, nexasim sibeh û ax, dema ku mirov tiştêkî biçîne, û li ber çavên wî roj bi roj mezin dibe, mîna ku stranek xweş derkeve û lê bê guhdarkirin.

- Em karin mana te li Rojava û girêdana te bi erdê ve,bînin watiyê wek ku em tişkî biçînin ?

Belê ji ber ku mirovê di erdê de kar dike, bêtir nîrxê ax û heriyê dizane,bêtir pêve tê girêdan.

- Bang û gotina we ya dawî ji bo şoreşê û hunerê û Rojava?

bo hunerê ez karim li ser xwe biaxivim, ez dikarim ta roja dawî xizmetê ji hunera Kurdî re bikim,lê gava ku min dît ez bûme bar ezê dakevim û dev ji hunerê bîqerim.

Ji bo Rojava ez bi hêvî me ku zû ne dereng aramî û çaraserîk ji me re bê danîn, ne ji miletê Kurd tenê re lê belê çî miletê ku di vê rewşê de dijîn û ev milet azadiyê û wekheviyê bibînin.

Şoreş: tu kesek nikare kela dilê şoreşan vemirîne, her şoreş biserketin e.

- Hun dixwazin di hunera xwe de bigihên kû derê?

Daxwaza min bigihim hemû hêviyên ku min xwestiye di hunera xwe de pêş bixim, û hîn ez hewl didim di hunera xwe de pêş bikevim.

- Gelo hunermend li Rojavayê Kurdistanê aboriya wan baş dibe, li pişt stranê?

Na , her û her hunermend ji kîsî xwe xerc kiriye, û niha jî wisa dibe, divê hin kompanî hebin rahêjin vî barî, mînak tim min ji kîsî xwe elbomên xwe dadigirtin, lê di vê elboma dawî de min girêbestek bi kenala «VÎN» tv re girêda, tenê vê carê min ji kîsî xwe xerc nekir.



Xwezîyarêtuya min baJiberserê miraneba Herdem li berçavê mi ba Bi tegulêdilşabiba EzzerbûmewekeşimaRuh di canê min jînema Hemîjiberkul û xemaCarektunabêjîçima. Helbesta (LêEsmerê) ji /MistekAzar/ aHelbestvanİsmetSeyda.

Ji destpêkê ve (Xwezî), lavij û xewn, yek ji bingehên sereke yên helbestê û yek ji şeweyên ramana mirovê Kurd e ku tim hewl dida pirsgrêkên jiyana xwe bi xweziyan çareser bike, tevî mirovê sawîrhez dûrî rastiya jiyane û bingehên zanyarî tê xuyakirin, lê ev e Kurd û ev e helbesta kurdî, çelengiya xwe ji êşa xwe dibin.

Xwezî yarê tu ya min ba: Têkiliya evîndar û yar di vê helbestê de arîxwedîtî ye, ev ji cînava arîziyê (ya min) diyar dibe, helbestevan dixwaze yar tiştek taybet bi wî be, ew xwediyê wê be, di helbestên bi vî rengî de xwêner pêşbîn dibe ku wê yar wêneyeke xweşik xuya bibe bê pesnên ku kesayetiya wê wek mirov diyar bikin. Lêker (ba) di raweya bilanî de hatiye, ev bi xweziyê re lihevhatî ye, lê tiştê ku me radiwestîne çawa xwezî di dema bûrî de hatiye? Tiştek vê şirove nake ji bilî ku ew xwezî ne lavij e, ne geşbînî ye, lê tenê ew hisretek e ku rastî ne wilo ye. Ji ber serê mi raneba: Tê xwestî ku tu liv nebe, ji ber lêker bi neyîniyê hatiye girêdan, rewşa herdu evîndaran rawestan û aramî ye, yar guhdan û pasevaniyê dike û evîndarê xwe dilgêş dike, evîndar ji çavdêrê xweziya xwe (yar) e. Herdem li ber çavê min ba: Xweziya xwe tekez dike, civaneke aram, bêlebat û

berdewam.

Bi te gulê dilşa bîba: Lêkera bilanî berdewam e û vê carê (bi te) yarê dike alavek ji bo pêkanîna xweziya dilşabûnê, yara weke gulê ji ji derbirînên belavbûyî ye di tevaya cihanê de, ne tenê di helbestê de, belê di zimanê rojane de ji keça xweşik weke gulê tê pesindan. Ez zer bûme weke şîma: Ev wêne nû ye, ji afirandina helbestevan e, pêkhatên wê pir lihevhatî ne, bi taybetî rengê şîmayê, rengê xemê ye, rengê nexweşiyê ye, rengê payiz û hişkbûnê ye.

Ruh di canê min ji nema: Diyar e ku helbestevan zimanê xwe yê devkî bi kar tîne, wî can bi wateya laş bi kar aniye, ev wate li hin herêman heye, ev hevok wateya mirinê dide, mirin ji ber evîne û mirin bi hisreta yarê. Hemî ji ber kul û xema: Ew mirin ji ber (kul û xema) e, ev herdu peyvên hevwater di gelek helbestên klasîk de heval in ta asta ku weke yekpeyvê têne xuyakirin.

Carek tu nabêjî çîma: Tevî ewqas azarkêşî deng ji yarê nayê, nabêje çîma wilo? Çîma ne ya evîndar e? Çîma ne li ber serê wî ye û dil pê şanabe? Ev rastiya neguhdanê ji aliyê yarê ve bi tûjî xwe êşkere dike û êşeke zor ji evîndar re peyda dike. Ev helbest ji aliyê hunermend kanîwar ve bûye stran, û stranek navdar e

Xalid Umer bi Helbestekê Gazî Hevalê) (Xwe Yê Girtî “Birahîm Xelîl” Dike Nûçeya Girtinê



Ey birayê ne ji bav û ne ji dê Lê birayê soz û peyman û kedê Wa Birahîm wê çîlo çav rakevin Ez nizanîm wê çîlo şev biqedê Heyfe îro serwerê xama bedew Ketîye destê serwerê tar û bedê Nûçeya girtna te lerzek ma çî ye? Dihejî bin mi de qasê kumbedê Wa Birahîm ez çî bêjim qeleman ger bipirsîn ka ximava zebedê

Wa Birahîm ez çî bêjim qeseban Ger ku bêjin kanî xwediyê mivredê Wa Birahîn tu ji destê min derketî Ey hevalo ser te bin destê Xwedê

Nivîskar Birahîm Xelîl endamê desteya birêvebir ya Yakîtiya Nivîskarên Kurd- Sûriya

Bê Te

Bê te ez mirî me
Bê te jîna min tarî ye
Bê te ez xerîb mam «Yara Min»
Hêvî û evîna min kuştî ne
«Yar yar yara min»
Bê te ez mirî me
Bê te dilê min sêwî ye
Bê te bextê min tarî ye
Ruh û gîyan tev birîne
«Yar yar yara min»
Bê te ez mirî me
Bê te jîna min tarî ye
Bê te ez xerîb mam «Yara Min»
Hêvî û evîna min kuştî ne

«Yar yar yara min»
Bê te ez mirî me
Bê te umr dişewitînim
Bê te «Yara Min» dil xemgîn e
Jiyana min bê te ne ti jîn e
«Yar yar yara min»
Bê te ez mirî me
Bê te jîna min tarî ye
Bê te ez xerîb mam «Yara Min»
Hêvî û evîna min kuştî ne
«Yar yar yara min»

Ehmed Mustefa

Kirasê gunehkaran

Ji xwe bike wî kirasê gunehkaran ji xwe bike bi bizmarê felekê ve daleqîne bila canê te bi kesayeta xwe biçirise çîma xwe pişt nêrîn û daxwazên civakî vedîşêrî bê hempa be bila tu nimûne bî sîmbol û nîşana azadiye bî bila rastiya dilê te yê pak wek dilopên avê bi canê te ve biherike ma ne nayê bîra te demê tu di nav pêçeka eşqeke rast de bû di hembêza evîneke bê guneh de û bi şîrê ji kaniya jiyane têr dibû ma nayê bîra te germa hêlîna te ax te zû bi zû, germa hêlîna xwe jibîr kir û bi ber bahoze çuyî û ji çoka ketî erê.. te serê xwe li ber sermaya zaliman tewand û bê berxwedan te hêla kirasê bi xwînê şûştin li ber te bikin kirasê gunehkaranji xwe bike de wî kirasî ji xwe bike .

Çîmen Mûrad

Tîrêk ji zimanê we

Ne ji bo êşa sala, birîndarim, ne ji kul û xem û derda,

Evxinizî ye

Ku min bi bêhna xwe Dilê darê şikand.. Û hêsirê wê li ser riwê Zarokên penaber.. ziwabûn ev xinizî ye.... Ku rojê taştiya xwe Berî sibehê xwar û kulîlkê buharê bi ser hişkiya xwe şewitandin ev xinizî ye.... ku ez dûrî te ketim û sitêr ji dîtina çavên te têr ne bûn Û kerwanên wan belav bûn ev xinizî ye.... Ku tu ne çû bi barîna baranê re û Tipên min ji peşkê helbesta te Têr venexwarin ev xinizî ye.... Ku tu min nehilî di pendê hêsirê xwe û têna evîne Li ser dilê xewna min ev xinizî ye....

XWEZÎ

Xwezî.. stêrkek dûr li ber dêmên heyvê bama li hemû zarokên cihanê bi mêvan bama minê... solînên temenên wan bi şahî û rûgeşiyê bixemilandana... Xwezî.. dilopek ji xwînê bama di damarên dayikên dilovan de biherikîma... minê dilên xemgîn hêsayî bikirana û rondikên çavên melûl daqurtandana. .. Xwezî.. ewrek mezin li asîmên bama



Çîmen Mûrad

çav zuha nabin, ji wa gotinên we, ji wa tîrên ji zimanê we hilpekîn, ez bûme hêjarek bi ax û nalîn, birîndarek bi xem, lê ber destê demsalê neyara, birînên rihê xwe, bi xwelîya agirê zalîma dikewînim, xwûna canê xwe, bi wê xwelîye diherimînim, erê, ez im, ya li ber çerxa felekê ketî, ez im, ya bi çîngîniya hesinê kawa re, bi tilîliyan mirî şîyar kirin, ya xiftanê heftrengî li ber kirin, erê, ez im daiyîka cudî û sîpan, ez im Zîna botan, û hêjî birînê xwe bi xwelîya agirê zalîma dikewînim, lê ew êş, ne êşa sala ye, êşa ji tîra zimanê we hilpekiye, êşa ji tîra zimanê we ye .



FewazOsê

ku mîraneke bindest ne be kaniyek aştîyê... azadiyê ji xaka welatekî birîndar ev xinizî ye.... Ku em nebin xwedî li Kobana lehingan li şîngala birîndar Û bi tipên zêrîn em wan nepêçin ev xinizî ye.... ev xinizî ye....

Bila bin xak nebe

Bila ciwanî jiyane li bejna xwe bike emir bi gul bike geş be li ser rûyan bila bin xak nebe. Bila kefenê spî li xwe nepêçe dîlana evîne li ser dîka hezkirinê bike bila bin xak nebe. Bila hest bi firê bikevin



Demhat Dêrikî

zîndan nebin, mirinê bi wê de bibin, zîldana hêviyan bibîne bila bin xak nebe.

Segvan im

Segvanê nîklê kewa bûm Li seyd û rav û nêçîrê Îro jar û li ber ba bûm Diketme qeyd û zincîrê Divêm aştî dilovanî Nîşanîm kû ji bo tîrê Ziwabûme bi yek carî Nemaye xwîn di pêsîrê


Nemaye xwî di rehan de Weza û jar û tim mest im Tenê hestê mi azad e Tevî îro kû bindest im Dilê min şûşeya bade Bi mestan re wîlo mest im Di nava mij û hewran de Bi bazdanîm qe nawestim

Di nava mij û moranê Qiralek birûskanî me Ji tîrsê meşê baranê

Firindeyekî Şepirze

Ez li firindeyekî şepirze, û veketî gudarî dikim. Wî bi xwe re dibim û ji nû wî hînî firandinê dikim. Firindeyekî çêkirî ji leka hûr. Ji firinde re dinivîsim tu di baskên min de bipûnîjî ey firinde û min fêr bike ma bi kêr tîm ko valabûnek bim mîna te. Ey firendeyê xirecira rengînkirî Bi wêne ne deng ketî ma nikilê min şevê diguhere wî bişkîne eger rast be derbirîn.

Ez firindeyekî dawî wêne dikim firindeyekî li ser devlikenîna xwe yî berdewam piştrast dibe wî bi ba re wêne dikim ew ê li ser rîya bandevin kevirî firindeyekî mîna min payîzê cot dike û li xirecira talankirî ji berbanga yekem ve ya helbestê guhdar dike Dibêjim hatiye dema ku serma cihê rokê bigire û baskên ewran hebin weke hemî bayên dîn dibêjim hatiye ew dema ku em bi mirinê re li hev werin,û em wî ji wê jiyana ku wî êşkence dike bazgûr



Ibrahîm Hiso

bikin. birînpêç bikin pelên daran pelek li pey pelekî û wan bispêrin mijê. dibêjim darkiriye bêtir ji divabûnê asîman û divê cihan ber bi vemirandina fenerên avêtî li ser keviyên helbestê ve here. dibêjim qadê bazgûr bikin ji xewa hertimî ji nû roja wêranbûyî dezgûn bikin û wê bikin deydîkin zelalkirî ji zarokan re. vekin herdu rexên stêran an jî yên mîna stêran û bihêlin ku sîtava wan vegire li ser îwanên mezin yên paşerojê û ji paşerojê re tu dergehane vekirî nehêlin ku ew tê re baz bide an jî ew bibe nêçîrek ji çuyîna ku ji ebedîna de bendewarî wî ye. Ji Erebi: Silêman Azer

KaTu Bê

Ronahî Şikrî

Gava buhar bê Ez ê pencerê vekim Li ber bê, ta ku bihna te têkeve odê Têkeve hingivê erdê. Têkeve mala Xwedê Wê çaxê Ez tenakim Siwarê Li rê Ez ê te bikim Hemû tiştê.... vê dinê.....



Xwedê Kirak Serok: “Ummet” “Welat” “Gel”!

Şahîn Bekir Soreklî



Paul Davies di pirtûka bi navê THE MIND OF GOD (Penguin Books, 1992, ji rûpelên 23-22) dinivîsîne:

“Pirr caran dihêt gotin ku tiştê mirovan û lawiran (heywanan) ji hev cuda dike hêza bikarhanîna mentiqê ye (...) Di nav çanda çerxên nezaniyê de (primitive cultures) fêhmkirina dunyayê bi sînor bû û xwe bi jiyana rojane ve peywendîgir («eleqedar» dikir, wekî demsalan, bikarhanîna kevirkaniyan yan tîrkevanan. Evan tiştên xwepêmişûlkirina di cîh de bûn û ne li ser bingeheên teoriyan bûn, ji bilî hinek tiştên ku xelkê wê demê wek sihirbaziyeke dihesibandin. Lê îroj, di qonaxa çerxa zanîne de (the age of science) têgihîştina me gellekî berfirehtir bûye, zanîn ta wê radeyê berfireh bûye ku em wê dikin beşên cuda, mîna astronomiyê, fizîkê, kîmyayê, jiyolojiyê, psikolojiyê û yê din (min bi mebest navên navneteweyî yên ji latînî yan yewnaniya kevnar bikar hanîn: Ş.B.S.). Ev pêşkevîna zanyariya berfireh hema-hema bi tevahî encama bikarhanî û ceribandina metodên zanistî ye (the scientific method)...”

Wekî me dît Davies gotina mirovên çerxên kevnar yên civatên dema nezaniyê dike, ku qaşo pirr ji yê îroj cuda bûne. Her weha mirovan û lawiran bi saya hebûna mentiqê li nik mirovan ji hev vediqetîne. Di heman demê de gotina pêşkevîna mezin ya dema nû dike. Lê gelo rast hemî mirov û hemî civat, yan kes, mentiqê ji xwe re dikin rêber?

Bi hezaran sal berê her rûdana mirovî jê fêhm nedikir wek sihirbazî dihat hesibandin. Lewma hinekên “zîrek” di nav komên mirovan de xwe wek sihirbaz dan zanîn, yan xelkê bi

xwe ew kirin sihirbaz. Sihirbazên weha îroj jî di nav hinek civatên li Amazonê û hinek şûnên din de hene. Û mirov dikare navên din jî li sihirbazên dema me bike, li ewên ku dikarin û dixwazin mêjiyên kesan bişon, bo nimûne.


Cihûti ji olên pirtûkî yê herî kevnar e, lê pêş wê jî ol hebûn, wek hindosiyê, şîntosiyê û olên îbadeta ji lawiran, volknan û pûtan re. Ola Cihûtiyê bo “Benî Israîl” bû, oleke bi rê û rêbaz bû û mu’icezeyên xudayî tê de roleke grîng dilîztin, wekî ku çawa çoyê di dest Mûsa de ava Deryaya Sor ji hev qelişand... Xirîstiyaniyê û Îslamê himên di cihûtiyê de ji xwe re kirin bingeş. Di wan de jî mu’iczeyan rola xwe dilîztin, wekî ku çawa Îsa kor, nexweş û seqet ji kêmasî û newexweşiyên wan rizgar dikirin, yan wekî ku çawa “teyrên ebabîl” şîjk bi ser neyarên koma li dijî musulmanan di şer de dibarandin. Lê heta bi van olan be, ku Xwedê ew bi rêya pêxemberan bi cîh kiribûn, da ku mirovên civatekê têxînin rêya rast, carine ji destpêkê ve û carine bi rê ve, bi xwe bûn stemkar, çimkî yê serpereşt di wan de ew ji bo amancên xwe bi kar hanîn. Li dû Îsa yê ku gotibû, “Dema kesekî silleyek li aliyê rastê yê rûyê te xist, aliyê çepê bidê” serpereştên ola wî bûn egera kujtina bi sedhezaran, yan zêdetir, bi navê wî û ola wî, li Ewropayê, her du Amerîkayan, Afrikayê û hinek şûnên din. Musilmanan bi navê Xwedê û Îslamê welatên neteweyên din kirin yê xwe û bi darê zorê xelk hanîn ser ola xwe. Îroj bikarhanîna navê “Ellah” bo amancên corbîcor didomîne. Cihû bi navê olê û Xwedê hîn îroj jî bi darê zorê

zeviyên Filistîniyan bi dest dixine û sîtema li hember wan didomîne. Ewropa bi sedan sal di bin siya reş ya stema serdariya ola Xirîstiyaniyê dinaliya ta ku xwe di nav 3-2 sedsalên par de ji wê stemê xelas kir û hêza kilîseyê, bişopan û bavekalan da sînorkirin, heta rakirin.

Ji olên pûtperestiyê bigir ta yê pirtûkan, hemîyan her tişt bi Xwedê ve girêdan, ew kirin hêza ku dikare hem baş û adilmend û mehrîban be û hem hêza sizakirina li dunyayê û li axîretê be.

Dema mirov civatên mirovan ji hezaran sal û vir ve bide pêş çavan, yek ji encamên grîng ku mirov ê bibîne ev e: Aliyê serpereşt her hewl daye ku hêzê, serpereştîyê û karbidetiyê bi dest xîne! Yan bi navê Xwedê û olê, yan bi navê Kirêl û welêt, yan bi navê serokeşîrî û eşîrê, û yan dû re bi navê serok û partiyê. Û hemîyan stema (zordariya) xwe, rindiya xwe û xirabiya xwe kirine, bi iddîa’aya ku ji bo xatirê “xelkê,” “ummetê,” “olê,” “neteweyê,” yan “gel” e. Lê pirr caran aliyê stem û neheqîya ji wan dîtî “xelk,” “ummet,” “ol,” yan “gel” bûne.

Tenê li wan şûnên ku rast demokrasîya rêxistinî û desthelatdariya ligor rêbeîya destûrî û hilbijartinên resen yê serbixwe û pîralî hene, endamên civatê ji stem û nehqî û rêyên xar yê olên stemkar û partiyên totalîter, qe nebe ta radeyekê, rizgar bûne. Rizgarbûna wan ta radeyekê bilind xwe bi pêşkevîna ramyarî, zanistiyê û bikarhanîna mentiqê ve girê dide, wekî ku Davies gotibû.



dike, ev pêşengeh ya duyemîn e jê re li bajarê Qamişlo, xelkên amade bi vê pêşengeha hêja û xweşik gelekî kêfxweş bûn.



Sîtar, Tevgera Civaka Demokrat (Tev-Dem), Saziya Zimanê Kurdî, Saziyên Civakên Sîvil, partiya Yekîtiya Demokrat «PYD» hatin xwendin, di gotinan de sipaşiya mamosteyan li ser karên wan hate kirin. Di daxuyaniyek taybet de bi rojnameya Bûyerpress re endamê Yekîtiya Mamosteyan Saxlem Fatimê got: « Di destpêka damezrandinê de gelek pîrsgirêk hatin pêşiya vê yekîtiyê, divê em bighên armançên xwe ta ku em asta fêrkirinê li Rojava bilind bikin «.

www.buyerpress.com
f buyerpress t buyerpress
m buyerpresss@gmail.com
WhatsApp 00905368908545



"Seyrana Kobanê" Li Amûdê Geş Dibe

Kobanê kelha berxwedanê ye, Sembola tekoşer û berxwedêran e, ji ber vê yekê gelek ji milletê Kurd li her çar perçeyên Kurdistanê û Kurdên li cîhanê belavbûyî jî navê zarokên xwe yê nû çêdibin dikin Kobanê.

Li bajarê Amûdê welatîyê bi navê Haşim Egîd wek sedên welatîyên Kurd li cîhanê navê Kobanê li keça xwe ya nû hatiye dinê kir, lê tiştê balkêş di mijarê de ku navê wê kiriye « Seyran Kobanê».

bavê « Seyran Kobanê» li ser binavkirina keça xwe ji Rojnameya Bûyerpress re ragihand: « Wek ku dihat xwestin ji her kes ê welatparêz

ku rola xwe di berxwedana rûmetê ya Kobanê û herweha di rizgarkirina wê de bilîze, min jî weke Kurdekî welatparêz ji bajarê Amûdê dixwest ku ta zarokên me yê di pêçekê de beşdarî vê tekoşîna pîroz bibin û her yek ji wan bibe Kobanê».

Egîd derbarê zêdekirin navê «Seyran» li « Kobanê» got: « Di vî warî de wek ku hûn dizanin buhar sembola jiyanek nû ye, Kobanê bi xwe bû buhar; buhara gelê Kurd û Kurdistan û cîhanê bi tevahî, bû dîrokek nû û ji ber ku dayika Kurd jî bi xwe dîrokeke, lewma min xwest ku ez vê dîrokê bi dîroka Kobanê ya nû ve girê dim, û min navê diya xwe



« Seyran» bi Kobanê ve girêda, min ev nav jî li keça xwe ya ku berî heyvekê hatiye dinê kir, ta ku bibe seyran li vê buharê angû li Kobanê, herweha min navê wê kir « Seyran Kobanê».

Mirovahî Çi ye?

Heger ew mirovê ku nebaşiyê dike, rê daba xwe û bêhnêkê pûnîjî ba, dê zanîba, ku di çîrokên afirandinê de, yan jî, di yê çêkirinê de, afrenêrê mezin, cudahiyeke pîr ciwan û berz daye wî, û ez dibêjim ewî nebaşî tucarî êdî nedikir.

Ji ber ku insan ji tevahiya niştociyên zemînê ciyawaztir e, hatiye afirandin, piraniya rengdêrên qenc û neqenc jî di hundirê xwe de dinasîne, lewra ewî mêjî heye û bedewiya ji derve û hundirîn jî heye, em dikarin bêjin rûkê cîhanê, xurist jî bi aysandina xwe ve ketiye bin daxwaz û dilkişîna wî de. Û di heman de mê de ez dikarim bêjim ku pêkarîna wî mirov jî hene ku evsanên hezîkirinê ava bike, lewma dergehên fireh jê re hatine vekirin ta dawî li piştê, da karibe bihêle ku bûhar û aranên zemînê bi hevdu re bikenin. Lê

gelo çima ev mirovê hanê bi vî tiştî ne gihiştî ye, yan jî gihiştîye lê berevajî wê çakiya di hundirê xwe de, neqenciye û wêraniyê pêk tîne ma ev ne riftarekî beloq e, bêhna mirovahiyê ji mirovan bi dûr dixê. Di dema îro de em meyze dikin piraniya kesên bûne perestkarê min miniya xwe, ta sînore korbûnê û nema êdî liber çavên wa ji ya wan pê ve xuya dike, ji xwe pê ve nabînin, bi tenê ji xwe re dixwazin , ji bîr dikin ku hemî pêkhatên din, ê bi wan re dijîn, mafê xwe hene wekî kesên din, jiyan bikin, bi dinyayê şa bibin û xwe di hundirê vê hebûnê de ya bi sosret, bibînin -Li vê derê pîrsek xwe davêje holê, gelo çima mirov ji bîr dikin ku pesnê herî xweş û zelal û geş, peyva lêbûrîna ye? Gelo çima ji bîr dikin ku pêkve- jîyan bi wateya xwe, tam hatiye pîvan li gor pêwîstiya mirovan û ji wê



pê ve felat tune ye? Gelo çima; mirov in hene hîn neketine wê baweriyê de, ku ew ê nikaribin, hevparê xwe di cîhanê de tune bikin, ji ber ku ew jî wê li ber xwe bidin ta dawî, û jiyana xwe bi hesanî radestî nemayîne nekin.! Û pîrsa herî dawî, gelo hin ji mirovan hejî dilê wan dibije jiyan(teba) ziving û qulên reştarî û hîn di wateya mirovahiyê de negihiştî ne!?

Komela Subarto Ahengekê Bo Komara Mehabad Lidar Dixe



Tev van rewşên awerte yê ku em ji hemû aliyên di herêma me de tê de dijîn, Komela Subarto ahengek ji bo komara Mehabad bi amedebûna girûpek ji mijûlên bi dîroka Kurdî ve û siyasîmedar û rewşenbîr li bajarê Qamişlo lidar xist

Aheng bi gotina komelê destpê kir, tê de li ser dîroka Komara Mehabad û dîroka Kurdî ya

nûjen axivî, pişt re dekomênt-filmek li ser Komara Mehabad hate weşandin, û hevpeyvînek di navbera nivîskar û rojnamevan Mehmûd Lawendî û lekolîner Xîro Ebidulilahi û tê de li ser dîroka Komara Mehabad axivîn û çawa hate damezrandin, ew kesyatîyên navdar yê ku rolek dîrokî û giring di damezrandina wê de lêstin; Qadî Mihemed û

Mela Mistefa Berzanî, herwiha serpêhatiyên ku bi serê Komarê de hatin anîn ziman. komara Mehabad di 1946-1-22 bi serokatiya nemir Qadî Mihemed li Rojhilatî Kurdistan hatibû damezrandin, hêja ye gotinê ku Komar ji ber gelek sedeman 11 heyvan dom kir.

Emar Ezîz çû Ber Dilovaniya Xwedê

Hunermend û ekter Kurd Emar Ezîz yê ku bi navê ” Tewaro ” dihat naskirin li Hewlêrê Paytexta Herêma

Kurdistanê koça dawî kir. Hêjayê gotinê ye ku Emar Ezîz di riya filmên “Bavê Teyar” de hat naskirin



Ew Min Fêrî Zimanê Xwe Dikin, Ez Wan Fêrî Kultura Xwe Dikim



Ehmedê Xursî, helbestvanekî Rojavayî ye, berî demeke ne dirêj berê xwe da Ewropayê. Ew jî ji ber rewşa welatê Sûriyê ku bûye 4 sal di şer û kuştin û wêranyê de ye, hîn çareserî jê re nehatiye dîtin. Ew jî wek gelek şîneyên welatê Sûrî, neçar man ku berê xwe

bidin koçberiyê û li wî cihî neştê bibin. Di «riya» vê koçberiyê de bi sedan afrêner, nivîskar, rojnamevan, koçber bûne, lê ya herî giring ew e ku ew hîn jî di êşa welatê xwe de dişwetin, û dibe ku ew jî yên ku di hindir de mane bêtir jî diêşin, loma ew

bi hemû karîna xwe hewl didin ku ji çavê welatê xwe dûr neçin, lê binerin, li ser bigrîn, û jê re jî amade bin. Nimûne wek me li ser nivîsî helbestvan Ehmedê Xursî, xwe fêrî zimanê Elmanan dike, û pê re jî wan fêrî muzîk û kultura Kurdî dike.

Google'ê zimanê Kurdî jî lê zêde kir!

Kampaniya Google'ê zimanê kurdî jî li beşa "Google Translate" zêde kir. Ev demeke dirêj bû Kurdan hewl didan ku zimanê Kurdî jî têkeve nav zimanên Google Translate'ê û ser internetê gellek caran kampanya dihatin lidarxistin.

Kampanyayê Kurdan di dawiyê de Google'ê razî kir û îro di Google Translate de zimanê Kurdî jî tevî zimanên din ên cihanê bû. Nayê zanîn ku dê kengê Google beşa Kurdî ya di Google Translate'ê de aktîv bike.



Pisporê Kurd: Li Deverên Çiyayî Şilanan Bidin Mirîşkan



Pisporên ajelan ên Zanîngeha Yuzuncu Yîlê ya Wanê dibêjin, li deverên çiyayî û bilind mirîşk bi şilanan tîn xwedîkirin. Li Bakurê Kurdistanê, ji ber çiyayê û bilindiyê mirîşk nayên xwedîkirin. Lê pisporên Zanîngeha Wanê lêkolîn kirin û di encama wan lêkolînan de dîtin ku bi şilanan ev mumkin e. Mamosteyê Beşa Zooteknîkê ya Fakulteya Çandiniyê ya

Zanîngeha Yuzuncu Yîlê Ahmet Tekelî, behsa encama lêkolîna xwe kir û got:» Di hemû lêkolînan de tê dîtin ku ew dikarin bazirganiya goştê mirîşkan yê kêm dahn bikin. Tekelî wiha axivî: «Me şilan wek vîtamîna Cê bikar anî. Me dît ku ev stresa cemidîne jî dadixe û encamên baş dide. Êdî li herêma kesên hez dikin rihet dikarin mirîşkan xwedî bikin.»

Silo Tabloyek Ji Arîç û Kobanê Re Nexşand



Karîkaturesî Silo di vê tabloya xwe de, çend hespên spî û li pey wan jî komek zêde ji mirovan nexşandiye ku ji Kobanê ber bi Arîç dibezin. Karîkaturîstê Kurd Yehiya Silo, bi berhemên xwe rexne li siyaseta parçeyî ya Kurd, nakokiyên navbera rayedarên Kurdan û herwiha li têgeha "Serok" digre, tabloyek ji bo hunermendê Kurd Nîzamedîn Arîç û Kobanê

nexşandiye. Hunermendê Kurd Nîzamedîn Arîç jî beriya demkê klîpek ji bo Kobanê berhme anîbû. Karîkaturesî Silo di vê tabloya xwe de, çend hespên spî û li pey wan jî komek zêde ji mirovan nexşandiye ku ji Kobanê ber bi Arîç dibezin. Silo ev tablo diyarî hunermend Nîzamedîn Arîç kir.

Kurdî Xweş e



Zordarî	اعتداء	Zeplek	عضلة
Zorlêkirin	الزام	Ziyandar	متضرر
destdirêjî	اغتصاب	Ziyandar	متضرر
Zormilî	تعسف	zorbed	فطع
Zorpêkirin	فرض	Yadname	مذ
Xwegirêdan	نقد	Yekawaz	متناغم
Xwelibergirtin	صمود	Yekgotina	توافق

Mamik ???

Gayê dilo heftê cilo?
Hespa çê bazda hewşê?
Hêşin e kilîta wî hesin e?
Hilindir milindir kur ji bavê bilintir?
Rêsiya giya, li pişt xaniya?.

Bersiva Hejmara 11an
Genim- Def – Dîk- Pîvaz- Nêrgiz

Pend û şîretên Kurdî

- Gotinek bajarekî xera dike.
- Gotina dawî pêwîst be, mirov pêşî nebêje.
- Gotina xweş ji qulê dikişîne marê reş.
- Gotina xweş buhara dila ye.
- Her çêlek tê dotin lê her gotin nayê gotin
- Gotin ya te ye ku derket bela serê te ye.
- Gotina xweş ji her devî dernakeve

Zûbêj

Şemê şeş şerşef di serşoka
Şêrinê de de şîştin

XAÇERÊZ

Bersiva Bûri

Asoyî:

- 1-Bajarekî Rojava.
- 2-Li jora rû, pîrsgirêk.
- 3-Xwarinke koçeran, vexwarinek.
- 4-Ji bo hêrtina genim, Ji bo pîvana genim.
- 5-Amed (vajî).
- 6-Tersî girîdayî.
- 7-Paşnavê Ristemê leheng, pêşiya serî.
- 8-Zanyarê dîrokê.

Sitûnî:

- 1-Gundê Seydayê Cegerxwîn.
- 2-Movika navbera mil û dest, serdana bûkê bo malbavê.
- 3-Cureyekî şînî, şirove (vajî).
- 4-Bir (belawela), ji bo banga kur û mêran.
- 5-Wekhev, damar.
- 6-Wekhev, tilûrekî goşt xwer.
- 7-Wezîr+a.
- 8-Navçe (vajî), tersî kevn (vajî).

	1	2	3	4	5	6	7	8
1								
2								
3								
4								
5								
6								
7								
8								

	1	2	3	4	5	6	7	8
1	H	E	M	E	D	A	N	I
2	E	H		R	O	V	I	
3	S	M	I	D		A	V	I
4	K	E	L	E	H		R	R
5	I	D		Ş	Ê	X	O	
6	R		K	Ê	L	E		I
7	I	N		R	A	M	A	N
8	N	A	N		N		V	I